

**Agahiyên li bara venêrîna hevbeş a daneyan****“Tomara navendî bo belgeyên pênaseyê (IDR)”****li gorî madeya 13 û 14 ya Rêzikên Giştî yên Parastina Daneyan (DSGVO)****Nav û Hûrgiliyên pêwendiyê yên kontrolkarî:**

Bundesamt für Fremdenwesen und Asyl (Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiye)  
Modecenterstraße 22, 1030 Wien  
Tel: +43- 59 133 98 7004  
Faks: +43- 59 133 98 7399  
e-name: [BFA-Einlaufstelle@bmi.gv.at](mailto:BFA-Einlaufstelle@bmi.gv.at)

**Hûrgiliyên pêwendiyê yên berpîrsê parastina daneyan:**

Tel: +43- 59 133 98 - 0  
e-name: [BFA-Datenschutzbeauftragter@bmi.gv.at](mailto:BFA-Datenschutzbeauftragter@bmi.gv.at)

**Armanca venêrîna bo daneyên ferdî bi vê mebestê ye:**

Armanca venêrîneke wiha ya daneyan agahdarkirina rayedarekî ye li gorî madeya 22b, beşa 4 ya Peymana Pasaportê bi dayîna kutabûyî ya pasaportekê yan karteke pênaseyê, yan digel kiryarên li gorî peymana federal.

**Bingeha qanûnî bo venêrîne:**

Madeya 3, 16, 22a ya Peymana Pasaportê, Rojnameya Qanûna Federal hejmara 839/1992 wekî sererast bûye, têkildarî rêzikên pêkanîna peymana pasaportê (PassG-DV), Rojnameya Qanûna Federal II hejmara 223/2006 wekî sererast bûye, têkildarî Destûra Pasaportê (PassV), Rojnameya Qanûna Federal hejmara 861/1995 wekî sererast bûye, têkildarî Peymana Dewleta-E (E-GovG), Rojnameya Qanûna Federal I hejmara 10/2004 wekî sererast bûye, têkildarî Rêzikên Tomarkirinê yên ÇavkaniyaPIN (StZReg), Rojnameya Qanûna Federal II hejmara 57/2005 wekî sererast bûye.

**Dirêjahiya dema ku agahiyên ferdî yê werin xwedîkirin:**

Kiryarên pêwendîdar ên daneyan wê demê pak dibin ku ew dane êdî pêwîst nebin, lê herî zêde 10 salan piştî biryara dayîna pasaportê. Daneyên ji belgeyên raberbûyî salekê piştî bê-itibarbûna karta pênaseyê pak dibin bi rêz bo pasaportan – herî zêde 6 salan piştî kutabûna itibara pasaportê. Daneyên bikaranînê bi dest jê berdana bi itibar yan têkûzkirina qanûnî ya kiryarên wiha pak dibe. Daneyên pasaportê û karta pênaseyê salekê piştî ji dest dana itibarê pak dibin lê ne herî zêde 6 salan piştî kutabûna dema dewreya dawîn a itibarê. Daneyên pasaportên cîgirên ên windabûyî yan veguhestî salekê piştî kutabûna itibara wan pak dibe. Dane li gorî madeya 22a, beşa 1, mijara k ya Peymana Pasaportê divê herî zêde du mehan piştî şandina van belgeyan were pakkirin (made 3, beşa 6 ya Peymana Pasaportan) û herî zêde çar mehan piştî şandina wê bi rêya Wezaretê Federal a Ewrûpayê, Karên Têkelbûnê û Derve ve, yan jî bi dest jê berdana bi itibar bi rêz ya redbûna divêti yan redkirina daxwazekê tê pakkirin.

**Desteya kesên daneyên ferdî werdigirin:**

Rayedarên xwecihî yê xwedanşert ên pasaportê; dezgehên ewlehiyê; Rayedarên Tomarkirinê yê ÇavkaniyaPIN li gorî pîvanên diyarbûyî li Peymana Dewleta-E

Venêrner: IBM Österreich - Internationale Büromaschinen Gesellschaft m.b.H.; Microsoft Österreich GmbH; Bundesrechenzentrum GmbH.; Österreichische Staatsdruckerei GmbH

**Mafên mijara daneyan:**

Heqê gilîkirinê li Rayedarên Parastina Daneyan a Avûstryayê (1080 Wien, Wickenburggasse 8, tel +43 1 52 152-0, e-name [dsb@dsb.gv.at](mailto:dsb@dsb.gv.at)) li gorî madeya 24, benda 1 ya Peymana Parastina Daneyan bi kar tê (DSG).

Heqê dest gihîştinê li madeya 15 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê sererastkirinê li madeya 16 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê pakkirinê ('heqê jibîrbûnê') li madeya 17 ya DSGVO diyar bûye.

Tu heqê itirazê li gorî madeya 21 DSGVO tune ye û tu heqê kêmsînorkirina venêrîna daneyan li gorî madeya 18 ya DSGVO bo venêrîna daneyan nayê pêkanîn.